Royal College of Anaesthetists

Association of Paediatric Anaesthetists of Great Britain and Ireland

Raman Bahoz

Anestaziya heye

Wek çîrok ji gencan ra ku anestaziya wan heye

Trusted Information Creator
Patient Information Forum

Ew pêşniyarên ku li rûpla paşin bo dêûbav bixwênin

Silav, ez Raman im

Heftiya rabhûrî, ez li nexweşxanê hatim benckirin

Benckirin, dema ku pijişk derman di dê we daku hûn ne hest bikin, ne bihîzin ne bibînin di heyama neştergerî yê yan kirrayên demanê da. ew wek xwek kûr e.

Pijişk dê bencê bidê ta hûn hewcedarî ne, dema ku nema bidê we dê hûn şiyar bibin.

pêweista ez ji were bêjim wek çawe ye?



Hûn dikarin Zara, kera xetxetî, ew lîstika min ya herî şêrîne li ser her rûpelekî?

Xwe amadebikin

Dê baştir be, ku hûn hin tiştan digel xwe da bibin nexweşxanê Min çend cilên xewê, firça dinanan, pirtûkek û listikên min.



Bê xwarin

Dibê çi xwarin di hinavê we da nebê dema hûn bencdibin, wate divê ez tiştekî hîç nexwim tenê min hindik ev vexwar, daku ez tî nebim

Raman Bahoz dermanê bêhişkirinê heye

digel nexweşiyar da civîn bike

li nexweşxanê, **nexweşyar** kêşa min bipîve, daku pijişk zanibe çiqas benc bi min bide.

nexweşyar germa min pîva, û navê min li ser bazinê destê min danî, daku tev zanibin ez Raman Bahoz im.

Cûreyên cuda ji bencê/ anestisc ê

Min **anestazîzan** xwe dît. Ew pijişkê ku çavdêriya min dikir di heyama benckirina min da anestîzan dibê ku dest pê bike di rêya derzîkê di destê te da yan jî di rêya maskê em debarî baştrîn rê axifîn bo min.

tu dukarê merhemê li destê xwe bixe daku êşa derzî yê raweste. Benca ku di derzî yê da derbas dibe zûbizû bandore xwe heye

Lê di rêya maskê da demek dirêjtir dixwe Lê tevî ku di rêya maskê da hûn becbibin, dê hîn hûn hewcdariya derzî yê bibin

Raman Bahoz dermanê bêhişkirinê heye



Dema neştergerî yê

Hinekî wextê min hebû ku ez bilîzim berî emeliyata xwe. Hemşîreya min ji min xwest ku ez kirasê nexweşxaneyê li xwe bikim. Lê hin zarokan pijama li xwe kiribûn li şûna kiras ve.

dibê hin derman bidin ta ji wî alî. Ew yek wiha dike ku hûn çi azarî nebînin, yan jî daku hûn bikevin xewyê da



Li odeya penckirinê

Di jûreya penckirinê de makîneyên bi navê **çavdêr** hebûn ku erkê wan alîkariya min bikin ku her dem li min binêrin. Yek ji dêûbavên min dikaribû bi min re were hundurê odeyê.

Paşê gava ez di xew de bûm dê û bavê min li benda min man. Min zanibû ku ew ne dûr in.



Di dema emeliyata min de

Tiştek nayê bîra min,anaestêzîzan min her dem bi min re bû. Li min miqate bûn û min penc kirin.

Raman Bahoz dermanê bêhişkirinê heye

Li odeya başbûnê

Dema emeliyata min qediya, anestîzîzan dermanê pencê qut kit da ku ez şiyar bibim. Hemşîreyek li odeya başbûnê li min nêrî heta ku dê û bavê min bi min re bin.

Min di destpêkê de piçek êşek piçûk hîs kir. Hemşîreyek yekser hindek derman da min, û di demeke kurt de baş bûm



Hest bi birçîbûn

Dema ku min dîsa dest bi birçîbûnê kir, hemşîrek hişt ku ez tiştekî bixwim û vexwim.

Min pişt re xwe baştir hîs kir

Mayîn li nexweşxaneyê

Pêwîst bû ez şevekê li nexweşxaneyê bimînim.
Yek ji dêûbavên min dikaribû bi min re bimîne.



Raman Bahoz dermanê bêhişkirinê heye

Dema çûyîna malê

Her kes li nexweşxaneyê pir dilşewat bû, lê ez kêfxweş bûm gava bû wextê çûyîna malê,.

Tu dikare rengan bide vî wêneyê ji bo min?

Bi xatirê te!

Kî kî ye û çi çi ye

Anestazîzan

Bijîşkê ku dermanê penckirinê dide we, û paşê li we dinêre heya ku wextê şiyarbûnê be.



Hemşîre

Kesên ku li we dinêrin dema emeliyata we de.



Pisporê lîstikê

Kesek li nexweşxaneyê ku ji we re dibe alîkar ku hûn bilîzin û fêm bikin ka çi tê serê we. Ne hemî nexweşxane pisporên lîstikê li wan hene.

Bijîjkên beşa xebitandinê (ODPs) û hemşîreyên emeliyatyê

Kesên ku alîkariya bijîjkê Penckirinê dikin ku li we binêre dema we penc dikin



Odeya emeliyatê

odeyek li nexweşxaneyê ye ku emeliyat lê tê kirin. Her tişt pir paqij e û kesên li wir dixebitin kincên mîna pijama û şepikan li xwe dikin ji bo ku porê wan serrast bimine .

makîneya çavdêriyê

Makîneyek ku bijîjk bi kar tîne ji bo ku hûn ji nêz ve çavê xwe li we bigire dema ku we penc dikin Ew li ser sînga we hin lezaqokan û li ser tiliya we pêçek bikar tîne da ku kontrol bike ka dilê we çiqas bilez lêdide û hûn çiqasî baş nefesê digirin.





Odeya başbûnê an yekîneya lênihêrîna piştî penckirinê (PACU)

Odeya ku zarok piştî penckirinê lê şiyar dibin.

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yên gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi tîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin niqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev ji bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin.

Hemû wergeran ji alî wergervanên ji civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsînor) tên çêkirin. Çawanîya van wergeran ji bo duristîya van heta ji dest tê tên venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Raman Bahoz dermanê bêhişkirinê heye

Meriv çawa vê belavokê bikar tîne

Agahî ji bo dêûbavan

Me ev belavok amade kiriye ji bo ku hûn bi zarokê xwe re bixwînin û ji bo wan amadekin ji penckirinê re. Ev belavok wê ew kesên ku ew dibe ku bibênin û hin tiştên ku dibe ku biqewimin bide nasandin. Hûn dikarin bidiel bikin ew kes an jî kesên di wêneyan de yên ku bi zarokê xwe re biçin nexweşxaneyê bi hineke din re ji ber ku malbat dikarin biryarên cuda bidin. Ji zarokê xwe re vebêjin ka çima hûn vê çîrokê ji wan re dixwînin. Girîng e ku meriv zanibe ka çîrok ji wan re tê çi wateyê û bibîne ka pirsên wan hene an na.

Ew dikare bibe alîkar ku hûn bihêlin zarokê we çîrokê bileyze û bi karanîna pêlîstokek nas re bi fikarên ku ew hebin re mijûl bibe. Dibe ku hin zarok li ser hestên xwe xêz bikin an boyax bikin.

Heger temenê zarokê we ji sê salî mezintir be, em pêşniyar dikin ku hûn wan amade bikin berî hefteyek ji penckririna we . Ji bo zarokên di bin sê sêyan de, em pêşniyar dikin ku hûn rojek berî hatina nexweşxaneyê wan amade bikin. Lêbelê, ji kerema xwe têgihîştina zarokê xwe li ber çavan bigirin.

Ji me re bêje ku tû çi difikire

Em pêşwaziya pêşniyarên ji bo baştirkirina vê belavokê dikin. Ger têbînîyên te hene ku tû dixwaze bighîne me, ji kerema xwe ji wan bi e-mail bişîne li ser: patientinformation@rcoa.ac.uk

Royal College of Anaesthetists
Churchill House
35 Red Lion Square
London WC1R 4SG

020 7092 1500

rcoa.ac.uk

Çapa Çaremîn, Nîsana 2023yê

Ev belavok dê di nav sê salan de ji roja weşanê ve were nirxandin.

© 2023 Royal College of Anesthetists and Association of Pediatric Anesthetists of Great Britain and Ireland

Dibe ku ev belavok ji bo çêkirina materyalên agahdariya nexweşan were kopî kirin. Ji kerema xwe vê çavkaniya orîjînal binivîsin. Heger hûn dixwazin beşek ji vê belavokê di weşaneke din de bikar bînin, divê agahîkirineke licih were nivîsandin û divê logo, marqe û wêneyan jê werin rakirin. Ji bo agahiyên zêdetir, ji kerema xwe bi me re têkilî bike.

Wêneyan hatine amadekirin ji aliyê Amanda Lillywhite ve